

**STANDARDÎZEKIRIN  
Û  
NÊZÎKKIRINA ZARAVAYÊN  
ZIMANÊ KURDÎ**



**Çeto Ozel**

NAVEROK		Rupel
1.	Çima Standardîzasyona Zimanê Kurdî pêwîst e?	3
2.	Guhertinên Ziman: Îdolekt, Devok û Zarava	4
3.	Zimanê Kurdî û Zaravayên Wê	6
4.	Di Warê Wêjeyi da Zaravayên Kurdî	7
5.	Bizavên Rastnîvîs û Standardîzekirina Zaravayên Kurdî	8
6.	Stratejîya Modernîzekirin û Standardîzekirina Zimanê Kurdî:	9
7.	Elfabe û Nivîs (Ortografî)	10
8.	Reforma Bêjeyan	12
9.	Astengên Li Ber Standardîzekirina Zimanê Kurdî	14
10.	Pêvek:1 Kurte Tabloya Zimanê Kurdî û Zaravayên Wê	15
11.	Pêvek:3 Kurte Tabloya Zimanên Hînd - Ewropî	16
12.	Çavkanî	17

## ÇIMA STANDARDÎZASYONA ZIMANÊ KURDÎ PÊWÎST E?

Ragihandin û têkilîyên di navbera gelê Kurd di her çar parçeyên Kurdistanê da çicaran wekî ya niha xurt û bihêz ne buye. Berê ji ber sedemên polîtîk û erdnîgarî pêşveçûn û guhertinên di zimanê Kurdî da di nav gelê Kurd da bi asanî belav nedibûn. Bi taybetî parçekirina welatê Kurdistanê û polîtîkayên Tirkiye, Îran û Sûriyê yên ku Kurdî axivtin û nivîsîn qedexa kirî ne tene rê li ber kemilîna zimanê Kurdî girt, belê rê li ber têkilî û hatiçûya di nav gelê Kurd da jî girt. Bi wî awayî cihê manevraya zimanê Kurdî hat teng kirin, guhertin û pêşveçûnên di ziman da li seranserê Kurdistanê belav nebûn û geşbûn û bişkiwtina ziman bi piranî herêmî ma. Ji ber wê qedexa gelek dijwar û asîmîlastiyonîst li dijî Kurdiyê hatî meşandin û qedexeya li ser perwerdehî û çapemenîya Kurdî, kemilîn û standardîzasyona zimanê Kurdî di sedsala bistê da hat asteng kirin û ew astengî, her çend wek berê nebin jî, hêj didomin. Ya duyem erdnîgarîya Kurdistanê ya ku bi çiyayên asteng pêktêt ji yek sedema ne ku pêşveçûn û guhertinên di ziman da belav nebûne û zaravayan gelek sûd/tên ji yek û dû newergirtine.

Tevî wê jî, îro netawa Kurd pêşveçûn û serkevtinên şoreşgerî pêktîne û zimanê Kurdî jî di prosesek xwe nûjenkirin û standardîzekirinê da derbas dibe. Pêşveçûn û guhertinên di civakan anjî di netewan da raman, kultur û rihek nû diafirîne û ziman jî herwekî di minaka zimanê Cihûyan, Îbraniyê da jî têt dîtin, nûjen dike. Civakên anjî neteweyên ku guhertinên şoreşgerî pêktînin zimanên wan jî pêşve diçe û xwe diguhere jiberku nirx û guhertinên nû yên şoreşgerî tenê xwe di warê civakî, kulturî, polîtîk, teknolojîk, şaristanî û aborîda diyar nakin, xwe di warê linguîstîkî da jî herî berbiçav dîyar dikin.

Li ser zimanê Kurdî sih-çil sal berê giftûgoyên standardîzasyonê gelek xurt nebûn çimkî netawa Kurd di heremên biçûk da parçe parçe mabû û amrazên ragihandinê jî an tûne bûn anjî gelek levaz bûn. Belê îro hem ji ber sedemên global wekî pêşveçûnên di warê ragihandinê da –telekomînîkasyon û înternet- çêbûyî û bi taybetî jî hem ji ber sedemên navxweyî wekî şoreşa di netawa Kurd da pêkhatî, cihê manevraya ziman fireh bûye û netewa Kurd xwe pirtir gehandiye yek û dû û hatiçûya di naw wan da asntir buye. Di jîyana rojane da jî têt dîtin ku devokên herêmî bersiva pêwîstiyên civakî û netewî nade. Ji ber wê jî standardîzasyon û nûjenkirina zimanê Kurdî divêt pêşwaziya pêwîstiyên hemû gelê Kurdistanê biket û kêrî gelê Kurdistanê mezin û yekbûyî jî bihêt.

Têkilîyên sosyalî, kulturî, aborî, akademîk û yên sîyasî îro di nav gelê Kurd da pirtir û xurtir buye. Konferansa îro li Hewlêrê li ser zimanê Kurdî çêdibe jî her ji yek encamên wan pêşveçûna ye. Hemû îndîkasyon nîşan dikin ku Kurdistan di transformasyonê netewî da derbas dibe. Ji bo pêşwaziya wan pêşveçûn û tranformasyonê jî pêdivî bi reform, nûjenbûn û standardîzasyona zimanê Kurdî çêbûye.

## GUHERTINÊN ZIMAN ÎDOLEKT, DEVOK Û ZARAVA

Yek ji xasiyetên (karakterîstîkên) ziman yê herî girîng ew e ku ziman bi awayek xwezayî xwe diguhure. Ziman zîndî ye û ew çî caran statîk namîne. Hergav dixemile, pêşdikeve û di nav xwe da guhertinên fonolojîk, morfolojîk û sentaksî pêk tîne. Gelek caran ew guhertine digehin astek wisa ku ragihandina di navbera axiftvanên zimanê da dixitîmine. Gava ew guhertin di navbera civakên cuda cuda ji ber sedemên coxrafîk, sosyâlî anjî polîtîk mezin dibin, hingî ziman jî hêdî hêdî cuda dibe; zarava û zimanên nû yên serbixwe çêdibin.

Di çî zimanan da axivtwan wekî yek û du naaxivin. Her axivtwanek zimani bi şêvek cuda diaxive ku di zanista ziman da dibêjinê **îdolekt**. Wê gavê mirov dikare bibêje ku di dinyayê da li gor hejmarê mirovan îdolekt hene. Ji bîlî guhertinên di axivtina kesên da dibe ku di axivtina herêmanê cuda cuda guhertinên fonolojîk jî hebin û ew guhertine jî herwekî **devokên** (aksanên) herêman tînan zanîn. Wek mînak: axivtwanên Kurdiyê yên li herêmanê cuda dijîn bêjeya “din, dîtir, dî” bi guhertinên cuda yên fonetîk bikartînin. Gava di nav civakên herêmanê cuda da di axivtwanên zimaneke da guhertinên sistematîk yên fonolojîk, morfolojîk û sentaksî hebin, belê yek û du jî têbigehin ew civak **zaravayên** (diyalektên) yek zimani diaxivin.

Îro zimane herî sereke wekî yên Germani (Elmani, Îngîlîzî, Denmarkî û hwd), Slavîk (Rusî, Bulgarî, Ukraynî û hwd) Îtalîk (Îtalî, Fransî, Îspanyolî û hwd) û Hînd-Îranî (Kurdî, Hîndî, Farisî û hwd) hemû di demê da diyalektên zimane ku îro mirî yê Hînd-Ewropî bûn (Pinker, S., 2007). Guhertinên di bêjeyên kolanê da wekî Kurdî **du**, Sanskrîtî **dva**, Latînî **duo**, Îngîlîzî **two** dîsa Kurdî **bra**, Sanskrîtî **bhratar**, Latînî **frater**, Îngîlîzî **brother** nîşan dîkin ko bîgehê wan zimanan yek bû û ew jî yek malbatê bûn belê îro jî ber guhertinên pir sedemî her yekî jî wan zimanan serbixwe ye.

Wek mînak: Li ser guhertinên fonem û fonolojîk di malbata zimane Kurdî yê Hînd-Ewropî da gelek lêkolînên berkevtî hatine kirin. Paşî lêkolînên zimanzan anjî oryantîst Sir William Jones (1786) zimanzanê Elmani Franz Bopp û zanistê Denmarkî Rasmus Rask, Jakob Grimm (yek ji brayên Grimm yê çîrok berhevkerên navdenk) di salên 1819-1822 de guhertin, wekhevî û cûdatiyên di zimane Hint-Ewropîda lêkolînên berkevtî kirin. Li gor zagona “tîpên bêdeng” ya Jakob Grimm, di zimane Proto-Hînd-Ewropîda **p** û **t** di zimane Germanî da dibin **f** û **th**. (Fromkin, V., Robert, R., 1998) Her çend zimane Kurdî di milê Hînd-Îranî, yê ku malbata Hînd-Ewropî da be jî, ew guhertin xwe di zimane Kurdî da jî diyar dîkin.

## Guhertina Dengê Bêjeyên Koka Wan Yek (Jakob Grimm)

Bêrê	bh	dh	gh	b	D	g	p	t	k
Paşî	b	d	g	p	T	k	f	θ	x/h

HÎND-EVRUPÎ	SANSKRÎTÎ	LATÎNÎ	ÎNGÎLÎZÎ	KURDÎ (Ç.O)
<b>P</b>	P <b>pad</b>	P <b>ped</b>	F <b>foot</b>	P <b>pê</b>
<b>T</b>	T <b>trayas</b>	T <b>tres</b>	T <b>three</b>	S <b>sê</b>
<b>D</b>	D <b>dva</b>	D <b>duo</b>	D <b>two</b>	D <b>du</b>
<b>BH</b>	BH <b>bhratar</b>	F <b>frater</b>	B <b>brother</b>	B <b>bra</b>
<b>B</b>	B <b>-</b>	B <b>labium</b>	B <b>lip</b>	B <b>lêv/b</b>
<b>G</b>	J <b>ajras</b>	G <b>ager</b>	K <b>acre</b>	K <b>aqar</b>

Pirsa kîjan ziman zimanek serbixwe ye û kîjan zarava ye gelek zelal nîn e. Denmarkî, Swêdî û Norwêjî dikarin yek û du têbigihin belê zimanê wan herwekî zimanên cuda û serbixwe tên pejirandin ji ber ko ew ziman di welatên cuda da tên axivtin û di rêzimana wan da guhertinên sistematîk hene. Herwiha, axivtwanên zimanên Hîndî û Urdî ku yek li Hindistanê ya dîtîr jî li Pakistanê têt axivtin wekhew yek û du têdigihin, belê dîsa jî zimanên cuda tên pejirandin. Li dijî wê, axivtwanên çend zimanên li Çînê tên axivtin wekî Mandarîn û Kantonîz her çend yek û du têngihin jî, ew ziman her wekî zaravayên zimanê Çînî tên pejirandin ji ber ko ew di yek welat da tên axivtin û wan sistemaka hevpar ya nivîsînê heye.

Her wekî têt dîtîn ne ji yek û du têgehiştin ne jî sînoren polîtîk bi serê xwe pîvanên têbar nîn in ji bo biryarek mîsoger ka kîjan ziman zarava ye û kîjan zimanê serbixwe ye. Belê bi gelemperî zarava herwekî versiyonên heman zimani ne ko di nav axivtwanan da têgihîştinek wekhew, rêzimanek bingehîn ko di navbera wan da guhertinên sistematîk ( fonolojîk, morfolojîk û sentaksî) heyî têt şirove kirin.

Yek ji sedemên guhertinên di navbera diyalektan da ew e ko axivtwanên heman zimanî bi awayek coxrafîk û sosyalî ji yek û du dûr dikevin. Ji ber dûrkevîne jî pêşkevîtin anjî guhertinên di zimanê herêmekê anjî beşekî civakî da nagehe herêm û civakên din. Ji bîlî wê jî, heke di nav civakeka zimanekî diaxive asteng û bariyerên polîtîk, sosyalî, fîzîkî ( çiya, sînor, derya), çînî, olî û etnîkî hebin bi taybetî jî heke ziman bixwe di bin fişarê da be û di her asteka jîyanê da qedexe be guhertin û pêşveçunên lînguîstîkî bi sanayi belav nabin û guhertinên zaravayî bi hêztir dibin.

Heke di nav civakekê anjî netewekê ragihandin, perwerde û çapemeniyek xurt hebe hingî guhertinên di zimanda kêmtir dibin û pirsa rastnivîs û zimanê standard jî gelek namîne. Belê di seranserê sedsala bîstê da asteng, bariyer û qedexeyên devleta Tîrkiye, Îran û Suriyê danî li ser ragihandin, perwerde û çapemeniya zimanê Kurdî rolek biyom leyizîye. Rastnivîs, standardîzasyon û kemilîna zimanê Kurdî di nav sînoren wan devletan da hatiye asteng kirin.

## ZIMANÊ KURDÎ Û ZARAVAYÊN WÊ

Kurdî zimanekî ji malbata zimanê Hînd-Ewropî ye. Di nav malbata zimanên Hînd-Ewropî da Kurdî cihe xwe di milê Hînd-Îranî beşa bakurê rojava da digire. Di wê çarçuvê da di nav zimanên Hînd – Ewropî da zimanên herî nezikî Kurdiyê Belucî, Farisî û Peştuyî ne. Kurdî di nav malbata zimanên Hînd-Ewropî da zimanek bijare ye û nêzikî 26 mîlyon kes (McDowall, David, 1996) axivtwanên wê hene.

Herçend li ser piraniya zaravayên Kurdî spekûlasyon hatibin kirin jî, di binetarê xwe da du beşên zaravayên Kurdî yên bingehîn hene. (Izady, M,R, 2005)

1. Milê Kirmancî: Zaravayê Kirmancî di nav xwe da dibe du milên bingehîn: 1. Beşa Behdînî ( anjî Kirmancîya Bakur) 2. Beşa Soranî ( anjî Kirmanciya Başur)
2. Milê Pehlewani: Zaravayê Pehlewani jî di nav xwe da dibe du grubên bingehîn: 1. Dimilî. 2. Guranî. Guranî di nav xweda dibe du mil: 1. Lakî 2. Hewramî.

**Milê Kirmancî:** Di nav zaravayên Kurdî da Kirmancî beşa herî gewre ye û nêzikî çar û sêyê 4/3 Kurdan bi wî zaravayê diaxive. Kurmancîya Bakur anjî Behdînanî li piraniya Bakurê Kurdistanê (li hemu herêmên li derveyi zaravayê Dimilî lê têt axivtin), Rojavayê Başurê Kurdistanê, Yekîtiya Sovyeta berê (Ermenîstan, Kazakistan, Ezerbeycan û Gurcistan), Bakurê Xoresanê li Şîrwan û Qoçanê, li Bakur û Rojavayê Kurdistanê Rohilat û li Libnanê têt axivtin. Ji bilî wê jî li Başurê Kurdistanê herêmên wekî Dihok, Zaxo, Hewlêr, Mîsil, Efrîn, Kamîşlo bi zaravayê Kirmanciya Bakur diaxivin. Di eslê xwe da Kirmanciya Bakur zaravayeke ko ji aliyê nêveka Kurdan pêçek pirtir ve têt axivtin.

Kirmanciya Başur (Soranî): li Başurê Kurdistanê (Sileymanî, Kerkuk, Hewlêr, Rewandiz), li Rojhelatê Kurdistanê ( li Başurê gola Urmiyê, Rojavayê Kirmanşah, Mehabad, Seqiz, Senendej, Boka, Banê) bi piranî zaravayê Kirmanciya Başur diaxivin.

**Milê Pehlewani:** Li Bakurê dûr yê Kurdistanê li herêmên jûrî rûbarên Firat, Mirat û Qizilirmakê bi zaravayê Dimilî, ko beşek ji Pehlewaniye ye, diaxivin. Kurdên Dersimê, Çevlikê û Sîverekê bi piranî Dimilî diaxivin. Li cor be cor herêmên Anatolyayê li Semsûr, Malatya, Maraş, li Başurê Kurdistanê (wekî zaravayê Şebek têt zanîn) li rojavayê bakurê Îranê (êlên Dimbili) hindek herêmên biçûk bi zaravayê Dimilî diaxivin.

Zaravayê Dimilî gelek nêzikî zaravayê Guraniyê ye. Li başurê dûr yê Kurdistanê hem li Îraqê û hem jî li Îranê, li Helepçe, Dînawerê, Hemedanê, Kirmanşahê, Xaneqînê heta Mendaliyê û li nêzikî Kerkukê jî hindek derdorên zaravayê Guranî têt axivtin. Di eslê xwe da hejmarek Kurdên rojavayê Belucîstanê jî bi Guranî diaxivin. Dîsa li çiyayên Elburzê jî herêmên boş yê Guranî axêv hene.

Yek ji zaravayên Guraniyê Hewramî, ko demekê zimanê sereke yê herêma Kurdistanê navîn, cihe ku îro Kirmanciya Başur (Soranî) lê têt axivtin, niha li Helepçe, navbera Merîvan û Pawayê di herêmek biçûk da têt axivtin.

Lakî jî yek ji binzaravayên Guraniyê yê girîng e. Lakî di herêmên başurê Hemadanê, Nehawend, Turiskan, Nurabad, Îlam, Gelan, Pehla, Horo, Sêlasela, li gundên Sêlakurê, li rojavayê Îranê bakurê Elîşarê têt axivtin. Herwiha ji Xoresanê heta Deryayê Spî civakên Lakî axêv hene. Dîsa li Ezerbeycan, çiyayên Elburzê, rex û çanên Deryayê Xezer, Xoresan, di navbera Kum û Keşan di herêmên çiyayî da, li Anatolyayê li dûrê bakurê Kurdistanê li Semsurê û li nêzîkî rûbarê Ceyhanê jî civakên Lakî axêv hene. (Izady, M,R, 2005)

Ji bilî zaravayên jorîn yê bingehîn gelek devok û binzaravayên hûr yê Kirmanciya Bakur, Kirmanciya Başur, Guranî, Dimilî, Lakî û Hewramiyê hene.

## **DI WARÊ WÊJEYI DA ZARAVAYÊN KURDÎ**

Li gor Izady (2005) mîrateya wêjeya Kurdî heta berê Îslamê diçe û piranî ew mîrate bi devkî ye. Beşek gewre ya wêjeya nivîskî di koçberiya Kurdistanê ya ku nêzîki heştad salan dom kirî da winda bûye. Tekstên wêjeyî yê herî kewn ko gehîştîye îro bi zaravayê Guranî hatine nivîsîn. Bi gelemperî Pehlewani û bi taybetî jî Guranî di demekê da xwediyê statuyek gelek bilind û gewre bûn. Di eslê xwe da Guranî û diyalekta wê Hewramî heta demên modern jî zimanê wêjeyî û civaka bilind bû. Xanedaniya Kurd ya Erdalan (1168-1867) heta ko hatiye roxandî jî bi zaravayê Guranî diaxivt. Ji ber wê hindê tekstên herî kewn yê gehîştîye îro bi zaravayê Pehlewani hatine nivîsîn.

Baba Tahirî Hemedanî (1000-1054) yek ji helbeswanên yekemîn e ku rubaî nivîsî. Ji ber melebûna Baba Tahir hem di Lakî/Guranî û hem jî di Farisî da, xebatên wî ji bo gelên her du netewan (Kurd û Faris) gelek bi rûmet bûn.

Li hemberî zaravayê Guranî, xebatên bi zaravayê Kirmancî hatiye nivîsîn bi gelemperî xebatên demên nêzîk in, belê xebata ola Êzidiyan Misheva Reş (ya ko ji soranî pirtir nêzîkî Bahdîniyê ye) îhtîmale ko di derdora sedsala 13 da hatibe nivîsîn. Heke dîroka nivîsandina wê xebatê berfirehtir bihêt belgekirin ew dê bibe xebata wêjeyî ya herî kewn ko bi Kirmanciya Bakur hatî nivîsîn.

Xebatên zaravayê Kirmancî yê gehîştî iro: Eli Herîrî (1425-1490), Feqiyê Teyran (1590-1666) Nivîskarê mevludê Mele Ehmedê Hekarî (1417-1494), Melayê Cizîrî (1570-1640), Ehmedê Xaniyê Hekarî (1650-1706), Mem û Zîn (Memê Alan û Zîna Botan), Îsmailê Bazidî (1654-1710, ferhangek biçûk ya termên Kurdî, Erebi û Farisî) û Pertew-begê Hekarî ne.

Helbestwanên bi zaravayê Kirmanciya Başur (Soranî) nivîsî wekî Bêsarani (1714-1802), Nalî (1797-1855), Mistefa Kurdî (1809-1866), Hecî Qadir Koyî (1815-1899) di sedsala 18 dest pê pêkiriye. (Kurdo, Q., 1990)

## **BÎZAVÊN RASTNÎVÎS Î STANDARDÎZEKÎRÎNA ZARAVAYÊN KURDÎ**

Prosesa standardîzekirina zaravayên Kurdî hêj gelek sava ye. Her ji ber wê hindê jî bi gelemperî rêjeya gelê Kurd ya ku dikarin zimanê Kurdî bixwînin û binivîsin gelek nizm e. Bi taybetî jî Kurdên Bakur (Tirkiye), yê Rojhilat (Îran) û yê Rojavayê Başur

(Suriye)derfeta xwendin û nivîsandina zimanê xwe nebûye ji ber ku devletên Tirk, Îran û Surî, perwerda bi zimanê Kurdî û bikaranîna wê di çapemeniyê da qedexe kiriye.

Standardîzekirina zimanê Kurdî ya ku di sedsala bîstê da hatiye kirin bi sê alfabe yên cûda hatine kirin. Li Başurê Kurdistanê û li Yekîtîya Sovyeta kewn bi desteka fermî û li Bakurê Kurdistanê jî bi insîyatîfa rewşenbîrê Kurd Mîr Celadet Bedîrxan bizavên standardîzekirina zimanê Kurdî dest pêkiriye.

Di sala 1931 da zaravayê Kurmanciya Başur (Sorani) ya ko zaravayê Kurdên li herêma Başurê Kurdistanê li Îraq û Îranê ye, bi pêşengiya rêveberîya Brîtanya, bi taybetî valî û lêkolînerê Brîtanî E. Soane, standardîzasyon hat teşvîqkirin û ji ber fişara Brîtanî jî her wekî zimanê fermî yê duyem bo Kurdan li Îraqê hat nasîn. Di wê prosesê da devoka Sileymaniyê wekî standard hat pejirandin. Nivîsandina wê bi tîpên Farisî û Erebi hatiye adapte kirin. Sorani heta ko otonomiya kulturel ji aliye hikimeta Îraqê di sala 1970 de hatî hilvişandin, li Kurdistanê Başur zimanê perwerdê, çapemenî û zankoyan bû. Îro jî Kirmanciya Başur zimanê fermî yê herêma Kurdistanê ye li Îraqê.

Li Yekitiya Sovyeta kewn standardîzasyona zimanê Kurdî li ser bingehê zaravayê Kurmanciya Bakur herwekî li başurê Komara Ermenî li derdorê Êrîvanê têt axivtin di sala 1940 de hatiye kirin. Nivîsandina wê li ser bingehê alfabeya Kirîlî ye. Alfabeya Kurdî -Sovyetî ji aliye çend zimannasên li Enstîtûya Leningradê beşa Lekolinên Îranî dixebitin hatiye amade kirin. Di nav çapemeniya bi wê zaravayê hatî standardîzekirin da çend pirtukên dibistanan, ferheng, rêziman û xebatên wêjeyî hene.

Bizava standardîzekirina zaravayê Kurmanciya Bakur di bin pêşengiya Mir Celadet Bedîrxan da gava yekem di kovara "Hawar" da, ya ko li Şamê û Beyrutê di navbera salên 1932-1943 hatiye çapkirin, hatiye bikaranîn û nasandin. Alfabeya Celadet Bedîrxan ya nûjen ji tîpên Latînî hatiye adapte kirin.

Rêya nivîsîna zaravayê Kurmanciya Bakur gelek dûr û dirêj e û heta sedsala 11-13 diçe. Rojnameya Kurdistan, ko di sala 1898 ji aliye rewşenbîrên Kurd ve bi alfabe ya Erebi li Qahirê û Îstembolê hatî çapkirin, her bi zaravayê Kirmanciya Bakur derkevtiye. Jibîlî kovara Hawar û rojnameya Kurdistan gelek kovar û rojnameyên din jî wekî Ronahî, Roja Nû, Rêya Teze û hwd, di prosesa standardîzekirina zaravayê Kurmanciya Bakur derkevtine.

## **STRATEJIYA MODERNÎZEKIRIN û STANDARDÎZEKIRINA ZIMANÊ KURDÎ:**

Di mijara modernîzekirin, standardîzekirin û normalkirina zimanê Kurdî da pêkanîna bizavek netewî pêwîst e. Dîroka standardîzekirina zimanê îro sereke û navnetewî tîjî tecrubeyên tal û eş û janan ne. Belê di wê sedsalê da pêwîst nîn e ku ew rêbaz û tecrube ji bo Kurdîyê jî bihên bikaranîn û dubare kirin. Ji bo standardîzekirina zimanê Kurdî pêwîstî bi rêbazek nûjen, li gor wê serdemê û li gor rastiya netewa Kurd ya îro heye. Rast e ku ji ber sedemên polîtîk, sosyalî û erdnîgarî, pirsê standardîzasyona zimanê Kurdî heta îro hatiye û pîrzaravî di zimanê Kurdî da kûrtir û xurtir buye. Belê dîsa rast e ku pîrzaravî



ji bo ziman û netewekî rewşek negatîv jî nîn e. Beravajîyê wê, pirzaravayî ji zimanê netewî ra dewlemendîyek gelek gewre ye belê dibe ko di xerab rêvebirina wê pirsê da rewşek dijî berjewendiyên gelê Kurd ji bo demek derbasî/tempirarî çêbe.

Her çend hemu ziman ji zaravayan pêk tên jî, gelek kes zaravayekê ziman dizanin û difikirin ku zaravayên din kêrî çî nahên. Ew zaravayekî bilind dikin û rumeteka gelek mezin pê didin belê zaravayên din jî biçuk dibînin. Di ramana wan kesane da zimanê çîna ku di aliyê sosyalî û aborî da xwedî bi hêz, xwedî desthilat û zaravayê wan yê di dibistanan da û di çapemeniyê da têt bikaranîn zaravayê herî baş e. Belê gelek vekirî dîyare ku ew têgeh û ramanên teng yên herêmî çî komekê ji bo rêya çareserîya standardkirina ziman nade.

Bêgoman ji bo nûjenkirin û standardîzasyona Kurdîyê girîng e ku ji zengîniya hemu zaravayan sûd bihête wergirtin. Bêşik e ku hebûna zaravayên Kurdî dikare hêzeke xurt bide zimanê nivîskî yê netewî. Di pratîka gelek zimanên dinyayê yên sereke em dibînin ku wan ji zaravayên xwe têt/sûd wergirtine û zaravayên wan zimanê wan yê netewî levaz nekirine belê bihêztir kirine.

Zaravayê ku dibe zimanê standard nahête wê wateyê ku ew zaravayê herî baş e û ji zaravayên din çêtir e. Her zimanek û her zaravayek wekhev xwedî avahiyek taybet ya fonolojîk, morfolojîk û sentaksî ne. Ji aliyê linguîstîkî ve çî zarav anjî ziman li ser çî zaravayan anjî zimanan nîn e. Ji ber wê jî raman û nirxandinên zaravayekî bilind dikin û yên din nizm dikin nirxandinên zanistî û linguîstîkî nîn in. Ew hêlengandinên bi gelemperî polîtîk û sosyalî ne.

Rikejeniya pêşxistina zimanekî anjî zaravayekî li ser berjewendiyên netewî dibe ko bizav û kedên nêzik kirina zaravayên Kurdî têt bide û asteng bike. Îro rewşa zimanê Kurdî ew e ku du zaravayên standard hene. Yek ji wan zaravayê Kurmanciya Başur e û ya din jî zaravayê Kirmanciya Bakur e. Yekbuna welatê Kurdistanê bi tepeserkin û biçuk dîtina zaravayên din yên Kurdî pêk nahêt. Zimanê Kurdî ji sedsalekî pirtir di bin şovenîzma zimanên Tirkî, Erebî û Farişî da maye. Kêm netewên dinyayê wekî Kurdan di bin asîmîlasyon û şovenîzma zimanên biyanî da bi serfirazî hebûna zimanê xwe parastine. Kurd di wî warî da xwedî tecrubeyên gelek tal in û naxwazin wan tecrubeyan di bin sazî û rêveberên xwe da dîsa dubare bikin.

Tevî wê jî, standardîzasyona zimanekî ji ber gelek sedeman girîng e û di prosesek dûr û dirêj da derbas dibe heta ku di serenserê welat da cihê xwe digire. Yek ji wan sedeman ew e ku zimanê standard derfetê dide axivtwanan da ku ragihandinek bihêz di nav civaka xwe da pêkbînin. Hebûna zimanek standard liser rêxistin û yekbuna civakî anjî neteweyî jî rolek erênî dileyize. Dîsa ew dikare nasnameyekê anjî prestîjekî jî bide axivtwanên zimanekî. Ya herî girîng jî ew e ko zimanê standard sîstema ragihandina netewî pêşve dibe û perwerdê, ku wek çîmentoya netew avakirinê bondora xwe heye, di dibistanan da asantir û bihêztir dike.

Herkeseke zimanekî dizane û diaxive, rêzimana wî zimanî jî dizane ji ber wê jî axivtwanên din yên heman zimanî dikarin wî têtbigihin û ew jî wan têtbigihe. Di nav

çarçuva rêziman de hertiştêkî ko axivtwan derbarê zimanê xwe de dizanin, wekî sîstema dangan fonolojî, sîstema rêzên bêje çêkirinê morfolojî, sîstema rêzên hevoksazîyê sentaks û sîstema wateyan semantîk, heye. Ji bilî wan jî di wê çarçuva rêziman de bêjeyên ziman anjî ferheng jî cihê xwe digire. Ji bo nêzik kirina zaravayên Kurdî, digel yekbuna alfabeyê pêwîst e ew beşên rêziman yên zaravayan bihên analîz kirin û wekhevî û cudatîyên wan berçav bînin derbaskirin. Belê di asta yekem da sîstema nivîsê û alfabe her wekî kilîla çareserkirina pirsê zimanê standard derdikeve pêş. Di rewşa îro da derfet heye ku Kurd zimanê xwe yê ku bi salan hatî bê prestîj kirin, tepeserkirin û pêrim kirin modernîze bikin û bigehînin astek bilintir û bi hêztir. Belê çawa?

### 1. Elfabe û Nivîs (Ortografî)

Sîstema nivîsandina zimanekî pêwîst e ku li gor pîvanên rêziman (fonolojî, morfolojî, sentaks, semantîk), sosyolojî, pedagojî, sosyolingûstîkî û zaravayî pêk were. Di wê çarçûvê da ji bo modernîzekirin û standardîzekirina ziman sîstemeka nivîsînê ya hevpar û yekbûna elfabeyê rolek bingehîntirîn heye. Kurdistan welatekî parçekirî ye û elfabeya wê jî parçekirî ye. Îro Kurd sê cûre elfabeyan bikartînin. Kurdên Bakurê Kurdistanê û yên diasporayê elfabeya Latînî, Kurdên Başur û Rojhilatê Kurdistanê elfabeya Erebi –Farisî û Kurdên Yekitiya Sovyeta kewn jî elfabeya Krîlî bikartînin. Ji wan sê elfabeyan kîjan dikare bersiva pêwîstiyên zimanê Kurdî yê îro bide? Ew dubendiye (diglossia) di nivîsîna Kurdiyê da dê çawa çareser bibe? Bêgoman pêwîst e ku sîstema nivîsê û elfabê li gor karakterîstîk û taybetmendiyên ziman be da ku bikare dengên di ziman da derbiêxe. Sê elfabeyên sereke yên îro Kurd bikartînin wek yên jêrî ne:

#### 1. Elfabeya Farisî – Erebi ya Kirmanciya Başur:

ا, ب, پ, ت, ج, چ, ح, خ, د, ر, ز, ژ, س, ش, ع, غ, ف, ق, ک, گ, ل, ل, م, ن, و, و, و, ه, ه, ی

#### 2. Elfabeya Latînî ya Kirmanciya Bakur:

Aa Bb Cc Çç Dd Ee Êê Ff Gg Hh Ii Îî Jj Kk Ll Mm Nn Oo Pp Qq, Rr Ss Şş Tt Uu Ûû Vv Ww Xx Yy Zz

#### 3. Elfabeya Krîlî ya Kurdên Kirmancî axêv yên Yekîtiya Sovyeta kewn:

A, Б, В, Г, Г', Д, Е, Э, Э', Ж, З, И, Ё, К, К', Л, М, Н, О, Ö, П, П', Р, Р', С, Т, Т', У, Ф, Х, Һ, Һ', Ч, Ч', Ш, Ш, Ь, Э,

Piralfabeyîya ku îro têt bikaranîn ne bi rizamendîya Kurdan çêbuye; belê di bin bandora devletên Kurdistanê kontrol dikin hatiye avakirin. Ji bilî îzolasyona polîtîk, aborî û sosyalî gelê Kurd ji aliyê lingûstîkî ve jî bi rêya pîrelfabetiyê ji yek û du hatiye îzolekirin û parçe kirin. Gelê Kurd bi awayek serbixwe biryara elfabeya xwe ya netewî nedaye; pîrelfabetî li ser Kurdan hatiye empozekirin. ”Li gor belgeyên çavdêr û rêvebirên Mîsilê ji bo Vezîrê Navxweyî yê Îraqê rêkiri, (5 Adar, 1932) delegasyona Kurd ya ko beşdarî

civîna helbijartina zaravayê Kurdî buyî, bi piranî daxwaza elfabeya Romanî kirine. Belê Hikimeta Iraqê û Britanya ew daxwazî her wekî bizavek parvekirina Iraqê dîtin û dijî wê daxwaza Kurdan derketin.” Disa di sala 1923 da elfabeya Erebî ya Tewfîk Wehbî adapteyî Kurdîyê kirî ji aliyê Wezaretê Perwerdeya Îraqê ve nehatiye qebul kerin. Herwisa, çend bizavên din yên adaptasyona elfabeya Erebî ji bo amedekarîya berhemên dibistana seretayî di wê demê da nehatine pejirandin. Di dawîya bizavên kesên taybet (Destûrî Zimanî Kurdî, Tewfîk, W., 1929, her di wê salê da Kovara Zarî Kurmancî) guhertin û reformên di elfabeya Erebî da ji aliyê Hikimeta Îraqê ve hatîye qebul kirin. (Hassanpour, A., 1992) Bêgoman projeya yek netew li jêr kontrola çar devletan û bikaranîna sê alfabeyan li dijî berjewendiyên Kurdan bû, belê daxwaza hêzen Kurdistan parçe kiri jî her ew bû.

Bi gelemperî têt pejirandin ku sîstema elfabeyê divêt ji aliyê polîtîk, sosyo-kultûrel, psîkolojî û pedagojî ve jî fonksiyonel bît. Bizavên standardîzekirin û nûjenkirina ziman bi rêya elfabeyek hevpar di binetare xwe da ji daxwazek gelêrî û polîtîk ji bo yekbûna zimanê netewekî derdikeve. Belê her çî qas nêzîkbûn û standardîzebûna zaravayan pêngaveka ber bi yekbûna netewî be jî, wekhev, dûrkevîna wan zaravayan jî towê cûdatîye diçîne.

Ji ber wan sedeman elfabeyek hevpar ji bo berjewendiyên netewekî rumetek gelek giranbaha heye. Ragihandina di navbera endamên gelekî bi alfabekek hevpar asantir dibe. Nemaze gelê Kurdistanê, ku ji aliyê polîtîk, aborî, sosyalî û lînguîstîkî ve ji yek û du hatîye îzole kirin, wek mijarek mirin û jînê pêwîstî bi alfabekek hevpar heye. Bi rêya alfabekek hevpar pêşveçûn û guhertinên di zimanda dikare bi rêya medyaya dîdenî û nivîskî bigehe hemu koncikên Kurdistanê. Bi wê awayî jî pêşvebirina xwendin û nivîsîna Kurdî ya ko rêjeya wê gelek nizm, dikare bi rêya alfabekek hevpar çareser bibe. Ji bilî wê jî, têkilîyên kulturî, pêşveçûnên bazirganî, sîyasî û akademîk bi alfabekek hevpar dikare bihêztir bigehe hemu kolan û rêxistinên Kurdistanê û Kurdên li diasporayê dijîn. Ya herî girîng jî ew e ku hebûna alfabekek hevpar û zimanek standard ji bo avakirina neteweyek yekbuyî rolek bingehîntirîn û gewretirîn dileyîze.

Ji bo pêkanîna wan armancan jî her civakek anjî neteweyek li gor avahîya/strûktura zimanê xwe elfabeya xwe dibijêre. Zimanên Hînd-Ewropî bi piranî elfabeya Latînî, ya ku li gor fonolojîya zimanên wan e, bikartînin. Zimanê Kurdî jî hem ji aliyê lînguîstîkî, genetîkî û hem jî ji aliyê dîrokî ve zimanek Hînd-Ewropî ye û ew herwekî piraniya zimanên din yên Hînd-Ewropî dewlemendê dengên dengdar e. Elfabeya Erebî di dengên bêdeng (konsonant) wekî *p, ç, j, g* û yên dengdar *a, e, ê, i, î, o, u, û* da kêmasî e û bersiva pêwîstîyên zimanê Kurdî nade. Bi gotinek din ji ber ku di elfabeya Erebî da kêmasîya tîpên bêdeng û yên dengdar heye û Kurdî jî dewlemendê tîpên dengdar e; ew alfabe li gor fonetîka Kurdîyê nîn e.

Rastîyek din jî ew e ku zimanê Kurdî êdî di nav sînorên xwe da derkevîtiye û hem li welatên cînarê Kurdistanê û hem jî li welatên Ewropayê hejmara penaberên Kurd her roj pirtir dibe. Ji aliyê ragihandina digel Kurdên li derveyî Kurdistanê dijîn jî elfabeya Latînî ji bo Kurdîyê kêrhatîtir e ji ber ku îro bi milyonan Kurdên diasporayê hene ku elfabeya Latînî bikartînin û wan derfeta fêrbûna elfabeya Erebî gelek nîn e. Ji bilî wan sedeman jî

ragihandin, dan û standina zanistî û teknolojîk di dinyaya îro da bi elfabeya Latînî bi hêztir û serubertir pêk têt.

Di avakirina zimanek netewî da pêwîst e ku daxwaz û pejirandina gel bixwe hebe. Piranîya gelê Kurd elfabeya Erebi bikarnaîne û ew elfabe ne tenê geşbûn û dewlemendbûna zimanê Kurdî asteng dike, belê li dijî xastek, berjewendî û realîteya gelê Kurdistanê ye.

Her çend elfabeya Erebi-Farisî elfabeya fermî ya rêveberîya Başûrê Kurdistanê be jî, di bikaranîna pratîk da çar û sê 4/3 Kurdan elfabeya Latînî bikartînin. Belê dîsa jî dubendîya (diglossia) di nivîsîna zimanê Kurdî da ragihandina di navbera gelê Kurd da xitimandîye. Ew dubendîye astengeke ku çareserîyeka demokratîk jêra bihête peyda kirin da ku bi serfirazî Kurd bibin xwedîyê alfabekek hevpar. Nûjenkirin, standardîzekirin û normalkirina zimanê Kurdî girêdayî wê çareseriyê ye.

## **2. Reforma Bêjeyan:**

Pirseke mezin di zimanê Kurdî da pîrsa bêjeyan e. Di zaravayên Kurdî yê herêmî da dibe ku ji bo heman tiştî bêjeyên cuda bên bikaranîn. Dîsa dibe ko di bikaranîna bêjeyan da guhertinên fonolojîk hebin. Ji bilî wan jî bêjeyên ji aliyê nivîskarên serbixwe ve hatî çêkirin/afirandin û bêjeyên cûda cûda ji bo heman tiştî anjî têgehê ji zimanên bîyanî hatî qerkirin, guhertinên bêjeyî di nav zaravan da kûrtir dike. Wek mînak, di be ku Kurdên Rojhilat ji Farisîyê, yê Îraq û Suriyê ji Erebiyê, yê Tirkiyê ji Tirkiyê, yê Yekîtiya Sovyeta kewn û yê dîasporayê jî ji gelek zimanên cûda bêje qer kiribin. Wek mînak: "xeberdan, şitexilîn, qise kirin, mijulbîn, sihbet kirin" ji bo heman tiştî "axivtin/peyivîn" tên bikaranîn.

Ji zimanên bîyanî bêje qerkirin yek ji serukaniyên girîng e ji bo termên nû di ziman da û em dibînin ku hemu zimanan bêje qerkirine. Bi taybetî bêjeyên teknîkî û têgehên nû ji ber pêwîstiyên acîl zû tên qer kirin. Kurdiyê ji zimanên cînar û zimanên dûr jî bêje qerkirine û adapteyê Kurdiyê kirine. Di wê rewşê da çi alozî nîn e belê alozî di wê rewşê da ye ko zaravayên Kurdiyê ji bo heman tiştî dibe ko ji gelek zimanên cûda bêje qer kiribin. Heman ew bêjeyên ku hatî qer kirin dibe ko di zaravayên din yê Kurdiyê da bixwe hebin.

Di hindek bêjeyên xwemalî Kurdiyê jî li gor herêmên cûda cûda guhertinên fonetîk çêbûne. Wek mînak: "niha, niho, nihe, noke, ana, hana" ji bo yek tiştî "wê gawê" ji aliyê Kurdan ve têt bikaranîn. Dîsa bêjeya "wisa, wusa, wisan, wesana, weto, wiha, wilo, welê" ji bo heman tiştî têt bikaranîn. Ji ber wê jî, reforma bêjeyan di zaravayên Kurdî da rolek gewre li ser modernîzekirin û standardîzekirina wî zimani diyelîze. Bi tomar kirin û analîzkirina bêjeyan ji aliyê fonolojîk, wekhevî û cûdatiyê ve hem dewlemendîya zaravayan û hem jî bandora wan ya erênî li ser zimanê standard dê bihêt dîtin.

Heta dawîya sedasala bîstê zaravayên Kurdiyê ji ber astengên polîtîk û erdnîgarî derfeta ragihandinê digel yek û du kêmbûyê û ji ber wê rewşa negatîf, li şûna ku bêjeyên pêwîst

ji zaravayê xwe qer bike, ji zimanên cîran qer kirine. Ew rewşê rêjeya têgihîştin û ragihandina di navbera axivtwanên zaravayên Kurdî da dikêşe xarê.

Îro bi saya amurên ragihandinê (internet,televizyon, radyo û hwd), pêşveçûnên siyasî (şoreşa di neteweya Kurd da pêkhatî), teknolojîk, û girovîrbûna dinyayê ew rewşa îzolasyonê ya berê gelek nemaye û derfet heye ko bêjeyên qerkirî di nav zaravayan da berçav bihên derbas kirin, û bêyi ku zirarê bide dewlemendîya zaravayan li şûna wan heke hebin bêjeyên xwemal bihên bikaranîn.

Heke Kurd di bikaranîna zimanê xwe da bêjeyên xwemal bikarbînin dê yek û du baştir têbigihin. Belê herwekî li jûrî jî hatî gotin di bêje qerkirinê da ji aliyê lingûîstîkî ve çî pirsgrêk nîn e. Dibe ku bêjeyên qerkirî bihên parastin, belê gava ziman bêjeyan qer dikin, zimanên ji malbata wan anjî zaravayên wan bixwe ji aliyê lingûîstîkî (fonolojî, morfolojî, sentaks û semantîk) ve herî jêhatî û kêrhatî ne. Bi wê rêbazê wekhevîya bêjeyan di nav zaravayan da dê pêşbikeve; guhertinên di zaravayan da dê kêmtir bike, zaravayan dê nêziktirê yek û du bike û bi gelemperî dê têgehiştinek bihêztir pêkbîne. Bi taybetî ji bo wê dema krîtîk zimanê Kurdîyê pêwîstî bi xebatek wisa heye. Di encamê da, bi standardîzekirina bêjeyan, bingehê zimanek netewî û standard dê qahîmtir û bihêztir bibe.

Karê standardîzekirin û nûjenkirina ziman herî baş dikare di sazîya akademîya ziman da bi rêbazên lînguîstîkî pêk were. Ew kar nahê wê wateyê ku akademî dê zimanek nû çêbiket. Çarçûva karê akademîyê xebata li ser zarava û zimanê gel e. Ferhenga bêjeyên zaravayan hem ji bo xurtkirina zimanê standard û hem jî ji bo nêzikkirina zaravayan divêt bihêt amade kirin. Herwiha, lêkolîn û amedkirina ferhenga bêjeyên hevwater ji bo zimanê standard serukaniyek girîng e.

Kurdistan û netawa Kurd di bizavek ber bi yekbûnê ve da ye û ew realîte divêt bihête dîtin û standardîzasyon li gor hemû Kurdistanê, ne tenê li gor Bakûr, Başur anjî Rojhilatê Kurdistanê bihête kirin; nexwe xeterek heye ku dê dîsa ziman herêmî bimîne û bersiva pêwîstiyên gelê Kurdistanê nede.

### **Astengên li ber elfabeyek hevpar û standardîzekirina Zimanê Kurdî**

Kêmasîya elfabeyek hevpar bi serê xwe astengek herî mezin e ku pêşîya yekîtîya zaravayan û standardîzekirina ziman digire. Bizavên standardîzekirina ziman her çend di nav rewşenbîr, xwendewan û gelê Kurd da motîvasiyonek xurt biafirîne jî ew rêye bêyî qelem û dirî nebûye û dîyar e ku niha pêve jî nabe. Dibe ku li dijî standardîzekirina ziman du cûre astengên bingehîn hebin:

- 1: Astengên derveyî
- 2: Astengên navxweyî

Heta niha stratejîya netew devletên Kurdistanê kontrol dikin ew bû ku gelê Kurd di nav xwe da asîmîle bikin û bihelînin. Ji ber wê konseptê wan ya hevpar, wan hemucaran di her babetekê da (aborî, siyasî, leşkerî, kulturî) li dijî Kurdan di astek herî bilind da

alîgirîya yek û du kirine. Dibe ku ew reformên zimanê Kurdî li gor berjewendîyen xwe nebînin û dijberîya xwê bidomînin.

Herwekî di dîroka standardîzekirina zimanê Kurdî da têt dîtin dibe ku dijberîya reforma ziman ji hindek sazî û kesên li dû berjewendîyên teng diçin were. Sazîyên konservatîv jî dibe ku ji ber sedemên olî li dijî guhertina elfabeya Erebî û normalkirina ziman derbikevin.


Wisa dîyar e ku îro hêzên ku dixwazin statûkoyê (rewşa ziman ya parçekirî) biparêzin dê bi hemu hêzên xwe ve li dijî bizavên elfabeyek netewî û standardîzekirina ziman ravestin. Tewî wê jî, di serê sedsala bîst û yekê da bingehên statûkoya kewnar li Rojhelata Navîn û Kurdistanê da gelek qahîm nîn e û ber bi hilweşînê ve diçe.

Di wê babetê da gotina dawî bila Celadet Elî Bedirxan bêje:

"Herwekî me çend caran gotiye yekîtiya miletî kurd bi yekîtiya zimanî kurdî tete pêş. **Di yekîtiya zimanê de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e.** Yanî ji bona nivîsandina zimanê miletê divêt zana û xwendewarên wî miletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabeyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wî elfabê bêne nivîsandin." Celadet Elî Bedirxan, Hawar, hej 9, 1932

Pêvek: 1

### KURTE TABLOYA KURDÎ Û ZARAVAYÊN WÊ



(Izady, M.R, 2005)

Pêvek: 2

KURTE TABLOYA ZIMANÊN HÎND -EWROPÎ

<b>MALBATA ZIMANÊN HÎND-EWROPÎ BZ:3500</b>	1. HÎND- ÎRAN	MILÊ HÎNDÎ SANSKRÎTÎ	Hîndî Bengalî	Pencapî Urduyî	
		MILÊ ÎRANÎ AVESTA PERSÎ MEDÎ	BAKURÊ ROJAVAYÊ ÎRAN	Kurdî Belucî	
			ROJAVAYÊ ÎRAN	Farisî Peştuyî	
	2. SLAVÎK		Bulgarî Çekî Polonî Sîrpî- Xîrvatî	Rusî Slovenî Ukreynî	Slovakî Makedonî
	3. BALTÎK		Letonî Litvanî		
	4. ERMENÎ				Ermenî
	5. ARNAVUTÎ				Arnavutî
	6. HELENÎK	Grekîya kewn			Grekî (Yewnanî)
	7. GERMEN	Bakur	Denmarkî Norvêjî	Îsveçî Îzlendî	
		Rojava	Elmanî Îngîlîzî	Frizî Yîdîşî	Filemenkî
8. ÎTALÎK	ROMANS (Latîn)	Îtalî Frensî Portekîzî	Katalonî Îspanyolî Romenî	Provençalî	
9. KALTÎK		Îskoç Galî Bretonî	Îrlendî Welşî		

Têbinî: Di tabloyê da hemu zimanên Hînd-Ewropî cih nagirin.



## ÇAVKANÎ

Bedirxan, C. Elî., (1932) Hawar, hejmar 9,

Fromkin, V., Robert R., (1998) An introduction to Language, sixth edition, Harcourt  
Brace College Publishers

Hassanpour, A., (1992) Nationalism and Language in Kurdistan 1918 - 1985, USA,

Izady, M. R., (2005) The Kurds, Taylor & Francis

Kurdo, Q., (1990) Gramera Zimanê Kurdî, Weşanên Koral

McDowall, D., (1996), The Kurds, Minority Rights Group International Report

Pinker, S., (2007), The Language Instinct, Harper Perennial Modern Classics